



Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên
Partiya
Yekîtiya
Demokrat
a Kurd li
Sûriyê -
YEKÎTÎ*

Xebat ji bo :

- * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
- * Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
- * Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

Hersal roja 22 ê Nîsanê ...

Di pêvajoyê û rûdanên hişyarbûna netewî de , û di çarçewa vegeer û guhdana li hinde bûyer, serpêhatî û rojên dîrokî yê bi nirx û pirwate de , roja 22 ê Heyva Nîsanê li ba gelê Kurd weke cejneke rojnamevaniyê hatiye nasîn , û ji demekê ve hersal têtê bîranîn . Ew roja ku li sala **1898** an li paytexta Misirê , bajarê **Qahîrê** , di çapxana dar-el-**Hîlal** de , yekemîn rojnameyêke bi zimanê dê di bin sernavê **Kurdistan** de hatibû weşandin û belav bûbû . Ango ev e **112** salin ku zana û rewşenbîrekî mîna **Miqdad Midhet Bedîrxan** xwediyê wê rojname dîrokî , destê xwe dabû ser birîne , û ji hîngê ve kul û derdên milletê xwe didane nasîn , dinivîsî û dibasî , dikir hawar û gazî , da Kurd bixwînin û zana bin , da ku, riya xwe nas bikin û jiyanêke bi rûmet bijîn .

Mirov dikare bibêje , ku ji hîngê ve û ta îro jî , ew doz û daxwaza rehmetî **Miqdad Midhet** li cî ye û her dê li cî be . Bi zimanekî dî , mirov dikare bibêje : *Tiştêk ciyê xwendin û zanebûnê nagire , û nezanî mirovan û gelan bê hêvî û bê hêz dike , ji hev dixîne , qels dike , şaş û wenda dike Lewre , dijminê hovane û herî sereke nezanî bi xwe ye . Loma jî **cegerxwîn** gotiye : *xwendin nebî kes naçe pêş , peyda dibin pir derd û êş ... Ev dîn û dewlet xwendine , ev tac û şewket xwendine .**

Rehmetî **Nûredîn Zaza** jî têra xwe ev rêç ajotiye û her gav xwestiye ku em guh bidine xwendinê û bi taybetî **D.R (11)**

Cejina Rojn.....

Rêxisina Qamişlo ya
P.Y.D K .S (YEKÎTÎ)

5

Danezana gerdûnî ya mafên mirovî

Dr. Kamîran Bêkes

6

Roja 22î Nîsana.....

Mr. Alan

9

17 ê Nîsanê

Rêberê Silivî

12

Nûce û Calakî

Nûçe û Çalakî

3000 peyvên Kurdî di nav zimanê Rûsî de

Pispor û dîrokzanê Rûsî Vadi Akarenk , ji demeke dirêj ve, lêgerîn û lêkolînan li ser dîrok û zimanzan û ji 15 salan ve li ser dîrok û zimanê Mezopotamiya dike. Di Pirtûka xwe ya dawî de, ya li ser dîroka Mezopotamiya, dide xuyan , ku bingeha çanda Ewropa û Asiya dispêre Mezopotamiya.

V. M ji ANF re çêra lêgerînên xwe dike û weha dibêje " *A rast, heke mijar dîroka cîhanê an jî dîroka şaristaniyê be, erdnîgariya ku divê her kes xwe bigihîne û bi şeweyekî bingehîn têkilî wê bibe, Mezopotamiya ye. Ji ber ku dîrok û şaristanî li wir dest pê kiriye, mirov çendî bi nava kûraniyên dîrokê de diçe, xwe digihîne serdeşt û quntarên Mezopotamiya û Zagrosan. Ev xak yek ji girîngtirîn navendên veguhestina şaristaniyan e. Bê guman dema ku şaristanî derketine holê, hê nasnava netewebûnê tunebûye, lêbelê gelê li vir zeyînî û qet ev dever bi cî nehiştî û li vir mayî, Kurd in. Ji ber vê yekê jî, hizra min ew e, wekî li dîroka Kurdan û zimanê Kurdî were kolandin, ev yek ê di heman demê de tevkariyên mezin li ronîkirina dîroka mirovahiyê bike. Gava ku dîrokzanek li qonaxên dîrokî yên teqez dikole, ew her kîjan dîrokzan be, quntarên Zagrosan lê derdikeve. Di rastiya xwe de, ev dever ne rawestgehek e, rola wê ew e, ku termînaleke dîrokî û çandî ye. Lê ji ber ku dîroka roja îro bi kartêka neteweperestiyê şewe girtiye, her dîrokzanek serê pêşî bala xwe dide ser dîroka xwe ya neteweyî û dibe avjenvanê ava xwe. Lêbelê Mezopotamiya dibe ew dever, ku hemû lêgerînên dîrokî bivê nevé wê werin tê re derkevin".*

Di dawiyê de, dide xuyan ku, di navbera zimanê Rûsî û Kurdî de, 3000 peyvên hevbeş tene

Dîtin û ev peyvên Rûsî ji Kurdî hatine wergirtin. Û Rûsan ne tenê ji warê ziman ve, belê ji warê çand ve jî, weke hemî gelên cîhanê gelek tişt ji çanda Mezopotamiya wergirtine.

Bi kurtî ji malpera Avêsta

Li Helebçe Peykerê D. Mîrîran

Di dema ku,ji bilî çiyaran dostên Kurdan tunebûn, xatûna Firansî, birêz Danyal Mîrîran hate hawara Kurdan û pişgiriyeke bê hempa ji bo gelê Kurd kir.



Lewre, ji bo piştgiyaya wê xanimê û bi beşdariya hin perlemantêrên Kurdistan , Îraq û berpirsiyarên navçeya Helebçe , li baxçeyê Helebçe, perde ji ser peykerê xatûnê rakirin. Hêjayî gotinê ye ku, ev peyker, ji aliyê hunermend Hamid Ehmed ve hatiye çêkirin.

Roja Newrozê, Rojeke Navnetewî ye

"Newroz Roja nû ye", li cîhanê, bêtirî 300 milyon mirov bi boneya vê rojê -ji 300 sal ve-, şahiyên li dar dixin. Lewre, komela giştî ya milletên hevgerî, ev roj, weke rojeke nevnêwî pejirand.

Hêjayî gotinê ye ku , biryara K.G. ya nevnêwî, ji aliyê nûnerê Ezerbêcanê ve hatibû pêşkêşkirin.

Gelo: Destlata me li Sûriyê, piştî vê biryarê, wê li xwe vegere û bi ser xwe de bipûnîje , daku ew jî biryareke weha bistîne ..an na?!



Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

CEJNA ÇARŞEMA SOR

Pertewê Şerqî

Wek diyar e, her cejnek, piştî rizgariyekê , serkeftinekê , baweriyekê , guhartinekê, yan jî sersalekê tête holê . Ji ber wê li seranserî cîhanê ,cejnên têvel bi awayên curbecur, ji aliyê gelan ve li dar dikevin .

Lê tim û tim, bandor û hikariya cejnên Olî, bêtirî cejnên din, li hest û mejûyê mirovên olperest heye .

Ola Ezdahî jî, wek hemû olan, cejnên xwe di kûraniya dîrokê de, lenger kûr berdane û ji wan cejnan, Cejna Çarşema Sor e, ya ku dikeve Çarşema yekê ji Nîsana Rojhilat (Şerqî),û ew li ba Kurdên Ezdahî ,rojeke gelek pîroz tê jimartin .

Di roja çardehî Nîsanê de, Kurdên Ezdahî, karwane-karwane ji gund û bajaran derketin û berên xwe dan cihên pîroz, wek zareta Şêx Hemît - ya ku dikeve navbera gundê Qestelê û Baflûnê - , Çêlxane - li nêzîkî gundê Qîbarê û Tirindê , û li ber girê Endarê . Li van hersê cihan govend û awazên rengereng li dar ketin.

Îsal cejna Çarşema Sor û bi taybetî li ber girê Endarê pir balkêş bû. Ji ber ku, hilma Mîd û Mîtaniyan, bi asîmanê çiyayê Kurmênc de berdida. Li rex wê jî, keskesor,çiya û darên zeytûnê sed reng û bîn diyarî ahenga Çarşema Sor dikirin û bê dudilî hemû tiştên di hembêza sirûştê de, li ber awazên def û tembûran semayên, bê westan digelandin.

Bi vî awayî ji xweserê sinfonî li saz diketin û zelaliya Ezdahiyê û rastiya Çarşema Sor bêtir diyar dibûn .

Bê guman, cejna Çarşema Sor, cejna Kurdên Ezdahî ye , lê belê, gelek Kurdên ne Ezdahî jî, di vê cejnê de, beşdar dibin .. Îsal rola dengbêj û komikên foliklorî, ahengbi şeweyekî ciywaz bi dawî dikirin.

Lê tiştê hîn bêtir, ku ew aheng û şahî dewlemend dikirin, ew Qewl û sirûdên Ola Ezdahî, bi zimanê Kurdî, ji aliyê Şêxan ve dihatin pêşkêşkirin bûn.

Miha Nîsanê Hat Çarşema Sor li Kurdên Ezdahî bû xelat Şahî û pîrozî di demên keç û xortan de wek rojê hilat .

Cejna Çarşema Sor li Kurdên Ezdahî pîroz be.

Alfêbaya Kurdî- Latînî li Ermenistanê bû fermî

Di Yekîtiya Sovyet ya berê de, perwerde û nivîsandin di nav Kurdan , di xwendegehan de, ji sala 1941 an ve, tîpên Kirîlî bi kar dihatin. Piştî hilweşandina Sovyet, rewşenbîr, mamoste û muxtarên gundan, daxwaz û pirsgirêkên xwe ragihandin destlata Ermenistanê. Piştî danûstandinê bi destlata Ermenistanê re, ji nû ve pirtûk bi tîpên latînî hatin nivîsandin. Li gundê Elegezê, bi beşdariya mamoste, rewşenbîr, serokên xwendegehan û mixtarên gundan,serokê şewra gelê Kurd li Ermenistanê, Kinyasê Hemîd,ragihand ku: "*Bi alîkarî û piştgriya we, tîpên latînî li şûna tîpên kirîlî, ji hêla destlata Ermenistanê ve ,bi şewekî fermî hate pejirandin*".

Gelo: Kînga destlata Sûriyê jî , kanibeşopa destlata Ermenistanê bajo!?...

Komîta şevbuhêrkan a Heleb bi boneya roja rojnemegeriyê**Rêzdariya nivîskarekî zimanê kurdî dike**

Li roja 22 î Nîsanê , komîta şevbuhêrkan a Heleb , bi beşdariya hejmarek ji zimanhez û çalakvanên zimanê kurdî , tabloyekê diyarî nivîskarekî kurdî dike . Di wê kurtehevdişinê de , endamekî komîte rola rojnamevanî û ragiyandinê di pêşvebirina miletan de , geşkirina rojnamegeriya Kurdî de diyar û ronî dike . Bi taybetî jî tîrêjan davêje ser ronakbîrê bi nav û deng – xwedanê yekemîn rojnameya kurdî ya ku , li 12î Nîsana sala 1898an li Qahîrê derhatî, Miqdad Midhet Bedirxan . Û weha ew pîrozbahiya bi şirovekirina vê mijarê ji aliyê tevan ve diqede .

Seîd Newresî binasin

Amedekar: Hesên Cûmî

S. Newresî di sala 1878 an de, li Nûrisê, navça Betlîsê ji dayîk dibe. Xwendina xwe ya pêşîn, li dibistana Mehmûd Celalî kuta dike. Ji ber zîrek, tîgihîştin û jîrbûna wî navê " Bedî-Elzeman lê tê kirin. Di sala 1894 an, di pirtûkxana Betlîsê de, du salan xwendina xwe berdewam dike. Piştê diçe Wanê û deh sala li wir bi cî û war dibe û kar û xebata xwe ya olî berdewam dike. Rojekê li qonaqa walî, di rojnameyekê de, nûçeyê weha dibîne " *daku em kanibin Misilmanan hukim bikin , divê em wan ji Quranê sar bikin*". Gava wê nûçeyê dibîne, S. N weha dibêje " *Ezê ji hemî gelên cîhanê re nîşan bidim Ku, Quran ronahiyeke ji Xwedê ve ye û tu carî nayê vemrandin*".

Ji bo vê yekê berê xwe dide paytexta Osmanî Stenbolê, li xana Şekirciyan bi cî û war dibe û tabloyekê bi deriyê xwe dixê, li ser weha dinivîse: " *Ji hemî pirsan re , bersiv heye , lê ji tu kesî pirs nayên kirin*". Olhez û kesên dixwazin ola Îslamî nas bikin, berê xwe didin wî .Di demeke kurt de, dibe navekî navdar û dengê wî li nav xelkê belav dibe.

Hêvî û merema S.N ew bû, ku li Wanê zanîngeheke Îslamî bi navê – zanîngeha Zehra-avabike. Ji bo vê daxwazê, berê xwe dide padîşahê Osmanî. Lê mixabin , padîşahê Osmanî guh nade wî. Di sala 1910 an de, vediger Wanê, li hemî bajarên Kurdistanê digere, bi serokeşîrên Kurdan re, li ser bûyerên demê dipeyive. Di sala 1911 an de, berê xwe dide Şamê, di mizgefta Emewî de, li ser rewşa siyasî, aborî û civakî ya civaka Îslamî dipeyive. Ew (xutbe) li Şamê çap dibe û bi navê (xutba Şamê) tê belavkirin. Piştê vedigere Stenbolê, pêwendiyê bi Kurdên stenbolê re dike , daku, wan şiyar bike. S.N di gotareke xwe de, li ser nexweşî û çareseriyê nexweşiyên Kurdan weha dibêje: " *Lihevkin, Quwet, heyat û birayetî se, dete. Sê*

cewhrên me hene, 1- Îslamefî. 2- Însanefî. 3- Miletê me ye. Û sê dujminên me hene 1- Feqîrî. 2- nezanî .3- cudatî (Ixtîlaf) .

Di şerê cêhanê yê yekem de, ji bo parastina welêt, bi şagirtên xwe ve, dikeve nav şer, pir şagirtên wî di şer de dimirin û ew jî ji hêla Rûsan ve tê girtin. Bi alîkariya hêzên Alman vedigere Stenbolê. Gava Ingilîz dikeve Stenbolê, S.N, Fetwekê li dijî dagîkeriya Ingilîz diweşîne. Di dema serhildana Anadolî de, S.N fetwe da ku her kesê li dijî dagîkeran şer bike, ew (mucahîde). Piştî serkeftina Kemalîzmê, ew bi şewekî fermî di meclîsa Anqerê de hate pêşwazîkirin.

Di serhidana Şêx Seîdê kal de, tê girtin ? penaberî Sparta dikin. Li wir piraniya berhemên xwe û ya herî bi nav û deng " *Nameyên Nûr*" dinivîse û diweşîne. Li wir jî bi 120 şagirtan ve tê girtin û wan dibin girtîgeha Eskîşehirê. Di dû re , pir caran tê girtin û penaberkirin , û sê caran serdestên dewletê hewil didin, ku wî bi jehrê bikujin. Cara dawî, li Stenbolê, ji ber pirtûka xwe ya bi navê " *Rêbera Ciwanan*" bi sê heyvan tê cezakirin.

Seîdê Kurd , di dawiya jiyana xwe de, diçe Ruhayê, li wir pir nexweş dibe. Daku, li Kurdistanê neyê veşartin, destlat fermana penaberiyê distine, ku wî careke din vegerînin Sparta. Di 23 î Avdara 1960î, li Ruhayê diçe ser dilovaniya xwedê. Lê mixabin, nijadperestiya dewletê û bi alîkariya Genêral Alpaslan Türkêş, laşê wî tê dizîn û ta nuha jî kes nizane gorna wî li kû ye?.

Cejna Rojnamevaniya Kurdî

Bi helkeftina cejna rojnamegeriya Kurdî, rêxistina Qamişlo ya Partiya Yekîtî ya demokrat a Kurd Li Sûriyê(YEKÎTÎ), roja Înê 23/04/2010Z şevbuhêrkek li dar xist. Birek ji rewşenbîr, zimanhez û xemxwarên çanda Kurdî lê beşdar bûn, û gotina jêrîn ji beşdaran re hate pêşkêşkirin:

Li 22ê Nîsana sala 1898an, Mîrê Kurd ê gewre **Miqdad Midhetê Bedirxan**, xameya xwe ya zêrîn ji ber kişandiyê, ji bo ku Kurd jî mîna hemî gelên cîhanê bibin xwedî pirtûk û rojname. Yekemîn car di dîroka gelê me ya nûjen de, wî rojnameyê Kurdî bi navê **KURDISTAN**, bi tîpên Erebi li Qahîrê weşandiyê, û ew roj li nik me Kurdan bûye rojê pîroz û giranbuha, bûye roja rojnamevaniya Kurdî.

Xinkar Ebdilhemîdê xwînrêj û hevkarên wî, bi armanca xeniqandina **KURDISTANê** di dergûşa wê de, gelek dek û dolabên têkçûyî gerandine. Lê, bi saya serê **Mîr Miqdad**, û pişt re jî birayê wî **Mîr Ebdurehman** - ewên ku li hember ferman û biryarên Sultanê serxweş, paçên sipî hilnedane, ji ya xwe nehatine xwar û di hoyên zor û dijwar de, di riyên tev rêl û kelem de çûne, û berdeyamî di deranîna rojnameya xwe de kirine. Ji bo wê, xebata wan a mezin û giran jî, ew ji gelê xwe yê Kurd re, li seranserê Kurdistanê bûne sembolîne bi rûmet û cihên xwe di nav rêzên navdar û qehremanan de girtine.

Di bîranîna 112saliya vê roja pîroz de, pêwîste îro em rewşa zimanê xwe di ber çavan re derbas bikin, û bi zanistî binirxînin. Dema mirov li zordestî û qedexeyên ser ziman, çand û çapemeniya Kurdî li Sûriyê temaşe dike, mirov dil bikul û xemgîn dibe. Ta niha, mikurhatin li hebûna gel û zimanê Kurdî li kêleka yê Erebi di makezagona welêt de cih ne girtiye, dibistan û zanîngehên bi zimanê

, derçûna pirtûk, rojname û kovarên Kurdî, xwendin û nivîsadinê bi zimanê Kurdî li me qedexe ne. Herweha zarokên me çavên xwe li jiyane vedikin, li malên xwe hîn zimanê dayika xwe dibin û bê vîna xwe, li dibistanan fêrî zimanê Erebi dibin- ya ku hin leq û hejên derûnî(nefsî) li nik wan peyda dike-

Bi van qedexeyên fermanan re, hin pirs serê xwe hildidin û bersivê dixwazin.

Mîna: Gelo çima zimanê Kurdî yê ku zimanê beşekî mezin



ji gelê Sûriyê ye tê bendkirin û bi tundî şerê hebûna wî dibe? Ma gelo çi biveya vê zimanî li ser zimanê Erebi yê bira, yan jî li ser welêt û welatparêziya Sûriyê heye?!. Ma gelo ev siyasetên nêzbîn li gor prensîp, bîrbawerî, hizr û boçûnên vê dem û çerxê ne?!

Bi rastî, mirov ji van biryar û kiryanan şaş û matmayî dimîne. Li şûna ku, karbidestên dewletê bi erk û stubariyên xwe di derhmafê zimanê gelê xwe de rabin, hemû alavên pêşketinê jê re pêşkêş û hêsan bikin, tersî wê, ew hewil didin ku wî ji holê rakin, pûç bikin û wî di zimanê Erebi de bipişêfin û wîndakirin!!..

Lê, ew ji bîr dikin ku zimanekî mîna zimanê Kurdî bi folklor, zargotin û toreya xwe dewlemend û zengîn, rehên xwe di xaka welêt de kûr û dûr berdaye, bi biryar û fermanên qedexekirinê winada nabe, her û her wê bejin û bala wî bilind bimîne.

Bêgoman e, di rewşeke wiha de, ji rewşenbîrên me Kurdan tê xwestin, ku ew bidin ser şopa mîrê xwe yê gewre, li zimanê dayika xwe xwedî derkevin û wî ji êrişên windakirin û tunekirinê biparêzin, nîfşê nû hîn **D.R (7)**

Danezana gerdûnî ya mafên mirovî (*)

Wergêr: Dr. Kamîran Bêkes

Dumahîka Hejmarê Borî**Benda 19.**

Herkesî mafê azadiya bîrûhizrê û bîrderbirinê heye; di nav vî mafî de jî, mafê bê xwetêkilkirina tukesî hilgirtina bîrûhizran, herweha mafê bêyî nasîna tu sînoran û bi her cure navgînan li agahdarî û ramanan gerîn, wergirtin û weşandina wan.

Benda 20.

1. Herkesî mafê azadiya beşdarbûna civîn û komelên aştxwazane heye.

2. Nabe tukes bête neçarkirin ku bibe endamê komeleyekê.

Benda 21.

1. Mafê herkesî heye, rasterast an jî bi riya nimînendeyên xwe yên bi serbestî hîlbijartî, di rêvebiriya (hukûmeta) welatê xwe de beşdar bibe.

2. Herkesî bi awayekî wekhev mafê wergirtina kar û fermanberiyên giştî yên welatê xwe heye.

3. Viyana gel bingehê deslata hukûmetê ye; divê ku ev viyan xwe di hîlbijartinên azad û xulane (dewrî) de, yên li ser bingehê wekhevî û dengdana nehên an jî li gora awayeke din e hempa ku azadiya dengdanê misoger bike, diyar bike.

Benda 22.

Herkesî, wek endamê civakê, mafê ewlehiya civakî heye, herweha maf heye ku bi riya alîkariya niştîmanî (neteweyî) û hevkarîya navneteweyî û li gora yasa, destûr û hatiniyên her dewletekê, doza bidestxistina mafên aborî, civakî û çandî, yên ku ji bo rûmeta wî û geşbûna serbest a kesayetiya wî girîng in, bike.

Benda 22.

Herkesî, wek endamê civakê, mafê ewlehiya civakî heye, herweha maf heye ku bi riya alîkariya niştîmanî (neteweyî)

û hevkarîya navneteweyî û li gora yasa, destûr û hatiniyên her dewletekê, doza bidestxistina mafên aborî, civakî û çandî, yên ku ji bo rûmeta wî û geşbûna serbest a kesayetiya wî girîng in, bike.

Benda 23.

1. Herkesî mafê karkirin, bijartina azad a karê xwe, bidestxistina mercên karkirinê ên rewa û layiq û parastina li dijî bêkariyê heye.

2. Herkesî, bê cidahî, maf heye ku ji bo heman karî destmizeke wekhev bistîne.

3. Herkesê ku kar dike mafê destmizeke (mûçeyeke) rewa û têrker heye, destmizeke ku kari be ji wî û ji malbata wî re jiyaneke şayanê (layiq) rûmeta mirovî ewle bike û eger pêwîst be bi şiyânên (amrazên) din ên parastina civakî bête tewaw kirin.

4. Herkesî ji bo parastina berjewendiyên xwe mafê damezrandina sendîkan û ketina nav wan heye.

Benda 24.

Herkesî mafê bihndan (vehesîn) û demên vala û nemaze mafê sînokirina hişmende a katên kar û mafê pişûdanên xulane yên bi destmiz heye.

Benda 25.

1. Herkesî mafê asteke jiyane ye ku têra ewlekirina tendurustî û xweşgozariya wî û ya malbata wî bike heye, nemaze têra ewlekirina xwarin, lixwekirin, mal, çavdêriya bijîşkî, wisa jî rajeyên (xizmetên) civakî ên pêwîst, herweha mafê ewlehiyê di rewşa bêkarî, nexweşî, seqetî, bîtî, pîrî an di rewşên, ji ber sedemên dervavî viyana wî, jidesdana amrazên jiyane.

2. Dayîktî û zaroktiyê mafê alîkarî û çavdêriyeke taybet hene. Hemû zarok, çi yên di zewacê de çi yên dervavî zewacê bûyî, divê xwediyê heman parastina civakî bin.

Benda 26.

Herkesî mafê hînbûnê heye. →

1. Divê ku hînbûn, bi kêmanî hînbûna destpêkî û bingehî, belaş be. Divê ku hînbûna destpêkî bivênevê be. Divê hînbûna teknîkî û pîşeyî bi firehî belav be û xwendina bilind jî divê bi wekhevîyeke giştî ji hemû kesan re, li gora şehrezayîya wan, vekirî be.

2. Divê ku hînkirin (perwerde) geşkirina giştî ya kesayetiya mirovî û xurtkirina rêza mafên mirovî û azadiyên bingehî armanc bigre. Divê ku ew hevtêgihîştin, çavpoşîkirin û dostaniyê di nav hemû gelan û hemû komên nijadî an olî de geş bike, herweha divê çalakiyên Neteweyên Yekbûyî yên ji bo parastina aştîyê bi pêş xîne.

3. Dê û bav di hîlbijartina şeweya perwerdekirina zarokên xwe de xwediyê mafê pêşî ne.

Benda 27.

1. Herkesî maf heye ku bi serbestî beşdarî jiyana çandî ya civakê bibe, ji huneran çêjê werbigre û beşdarî pêşveçûna zanistî bike û sûdê ji berhemên wê werbigre.

2. Herkesî mafê parastina berjewendiyên razber (moral) û şênber (material) yên ku ji berhema zanistî, wêjeyî an hunerî, ya ku ew bi xwe afirandeyê wê ye, hiltên heye.

Benda 28.

Herkesî mafê sistemeke civakî û navneteweyî ye wisan heye, ya ku tê de maf û azadiyên di vê Danezanê de berpêşkirî bikari bin bi giştî bêne bicihanîn.

Benda 29.

1. Herkesî li hember civakê, ya ku tenê tê de geşbûna serbest û giştî ya kesyetiya wî gengaz e, erk hene.

Di bikaranîna maf û azadiyên xwe de heryek tenê bi wan bendan tête çarçewkirin, yên ku yasayê tenê ji bo misogerkirina nasîn û rêza maf û azadiyên kesên din û ji bo bicihanîna xwastiniyên rast ên sinciyê, pergala giştî û xweşgozariya gelemper di civakeke

1-demokratane de daniye. 2-Ev maf û azadî, ne di rewşekê de, nikarin li dijî amanc û bîrdozên Neteweyên Yekbûyî bîn bikaranîn.

Benda 30.

Tu temneke vê Danezanê nikare bête şirovekirin wekî ku mafekî dide dewletekê, komekê an kesekî ku, bi mebesta têkdana maf û azadiyên ku tê de hatine berpêşkirin, beşdarî çalakiyekê bibe an kirinekê bike.

(*) Wergerandina **Dr. Kamiran Bêkes.**

Têbînî: Di wergerandinê de metnên Îngilîzî, Almanî, Sirbî, Hirvatî û Erebi hatine bikaranîn

Cejna....

zimên bikin, gotarên hêja, helbestên şêrîn û ciwan, romanên bedew, şanoyên nirxdar.. û hemî cûreyên toreyê pê binivîsin... Bila keç û lawên me zimanê xwe ji yên netewên dîtir kêmtir nebînin û ji kurdûna xwe şerm nekin. Ji ber ku li gor nirxandina rojhilatnasên payebilind ên mîna gorbuhuşt **Lazarêv**, ziman û folklorê gelê me, ji ziman û folklorên herî dewlemend ên dinyayê ne.

Di nerîn û baweriyên me de, girînge hemî rêxistinên siyasî, dezgehên civaka sîvîl, navend û komelên mafên mirov û hemû rewşenbîrên Kurdan, piştgiriye bidin çanda nûjen, çanda rêzgirtin û parastina mafên mirov, çanda aştî, çanda hezkirin û jihevhezkirinê. Herwisa pêwîste em ramanên diyalog û jiyana hevbeş di navbera hemî netewe û olan de bidine pêş. Li hêla din, girînge em nerîn û ramanên çewtî dij mirov, ramanên rikgîriya nijadî û quretiya milî li kû dibe bila bibe, rûreş û riswa bikin. Di vê helkeftina pîroz de, hêjaye em bi bîr bînin, ku roja **04/03/2010Z** rewşenbîrê Kurd ê hêja, mamosta **Rezoyê Osê** bi gewdê xwe ji nav me bar kir. Lê, ew bi rewanê xwe yê pak herdem û gav bi me re ye, bi we re ye, û di nav gelê xwe de ye. Baweriya me ew e, ku wî mîrxasê hêja dabû ser şopa Bedirxaniyan û jiyana xwe ji bo zimên, çand û wêjeya Kurdî terxandibû. Bila cihê wî buhuşt be.

Li dawiyê, em gurzek gul û kulîlkên rengîn diyarî rewanê hîmdarê rojnameya Kurdistanê dikin, cejna we û ya hemî rewşenbîrên Kurd li seranserê cîhanê pîroz dikin!

Rêxisina Qamişlo ya P.Y.D K .S (YEKÎTÎ)

Li Qamişloyê Kovara PIRSê Ahenga Çilrojîya nivîskar û rewşenbîrê Kurd Rezoyê Osê li dar xist

Bi beşdariya birek ji rewşenbîr, nivîskar, hezker û malbata nivîskarê hêja Rezoyê Osê, êvara pêncşembê 15/04/2010Z, bi xuleyê bê dengî li ser rewanê pak ê Rezo û rewanê hemî cangoriyên Kurd ahengê dest pê kir. Pêşkêşvanê wê weha got: Beşdarên hêja û bi rûmet...

Li destpêkê, bi navê Komîta birêvebir a Kovara PIRSê, em xêrhatina we dikin. Hêvî û omîda me ew e, ku di vê ahenga çilrojîya nivîskar û rewşenbîrê Kurd ê hêja, bira û hevkarê me Rezo yê Osê de, em bi hev re sinciyên wî yên bilind û mirovane, di bîra xwe de bînin, kar û xebata wî ya çil salî, di ber çand û zimanê Kurdî de, bi rêz û rûmet binirxînin.

Ji ber rewşa ewlekarî ya taybet a vê heyamê, me nikarîbû hemî dost, heval, hogir û hezkerên kek Rezo di vê ahengê de beşdar bikin. Em lêborînê ji we û hemî rewşenbîrên Kurd ên derveyî vê civatê dixwazin, hêvîdar in hûn kêmasiyên me bibexşînin.

Xwişk û birayên rêzdar...

Li nik desteya Kovara PIRSê biryar e, di hejmara wê ya bê de, dosayê fireh, yan hejmareke taybet li ser kek Rezo bête weşandin. Ji ber wilo jî, berhem, nivîs û lêkolînên ku li ser gorbuhuşt ji me re hatine, em ê wan di wê hejmarê de biweşînin. Herweha, emê derfetê ta dawîya vê mehê bidin nivîskar û hezkerên wî, kesê ku bixwaze li ser binivîse, ew dikare berhema xwe li ser navnîşana Kovarê bişîne. Berhemên ku ta niha gihane desteya Kovarê, ev in: 1-Lêkolîneke Rojnamevanî bi sernava (Rezo zindî ye) bi pênûsa nivîskar û endamê Komîta Kovara PIRSê yê berê birêz Dilovan hatiye nivîsandin. 2-Lêkolîneke zengîn û berfireh bi sernava (Rezo Osê, Kurdîzan, ronakbîr û folklornas) bi pênûsa endamê Komîta Kovara PIRSê yê berê mamoste Berzo hatiye nivîsandin. 3-Helbestek ji helbestvan Arşek Baravî bi sernava **YADÎGARA ÇILÎNIYA MIHRE RIZO OSÊ**

giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

4-Helbestek bi sernava **Rêheval Rezo** bi pênûsa helbestvanê Kurd ê hêja Mihemed Elî Heso giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

5-Helbestek ji helbestvan Tengezarê Marînî bi sernava **Peyv di çavên min de man** giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

6- Helbestek ji helbestvan Melevan Resûl bi sernava **Çavê min dawerivîn** giha şevê, hin malik jê hatin xwendin.

7-Helbestek ji helbestvan Mehmûdê Badilî bi sernava **EM** giha şevê.

8-Helbestek ji helbestvan Fîxan Osê bi sernava **Hestê min giha** şevê.

9-Helbestek bi sernava **Keskesorek ji Degşûrî** ji helbestvan Abdusemed Mehmûd giha şevê.

10-Birûskek ji Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê Zinar Soran giha şevê û hate xwendin.

11-Nameyêke ji Desteya birêvebir a çilrojîya Rezo li Hanover û endamên Kovara PIRSê yên berê Heyder Umer, Merwan Osman û Tengezarê Marînî giha şevê, hin movikên bijarte jê hatin xwendin.

12-Birûskek ji birêz Nazlî Xelîl (Diya Fuad) ji Stockholmê giha şevê û ew hate xwendin.

13-Birûskek ji Kovara AL-Hîwar giha şevê û ew hate xwendin.

14- helbestek bi sernava **bo Rezo Osê bi tena serê xwe** ji helbestvan **Arjen arî** ji Amed, ji Kurdistana bakur piştî şevê giha kovarê.

15-gotarek ji mamostê hêja Deham Ebdulfettah bi sernava **Tu çûyî! Lê, Tu ji bîr nabî heval ...!!** Piştî şevê giha kovarê.

Piştî vê xwendinê, ev gotarên li jêr hatin xwendin:

Gotina Kovara PIRSê. Gotina Kovarên Kurdî li Sûriyê. Gotina Mamostayê navdar Samiyê Mela Ehmedê Namî-Xezûrê gorbuhuşt Rezo. Gotina dost, heval û hogirên Rezo ji bal birêz Konê Reş ve hate xwendin. Gotina hevjîna Rezo, Nîgara Samiyê Namî hate xwendin Gotina Malbatê ji bal birêz Dr.Memo Abdî ve hate xwendin.

**Roja 22 î nîsana 2010 an roja bi dawîbûna
/15/ salan ji jiyana rojnama newrozê ye**

Memê Alan

Bi boneya roja rojnemevaniya kurdî , Rojnama Newroz û Yekîtî şevbuhêrkek , bi beşdariya gelek rojnemevan , nivîskar, rewşenbîr û zimanhezan li dar xist . şevbuhêrk bi kêlîkek bêdeng li ser giyana canfidayên rojnamegeriya kurdî û peyva azad dest pê bû , piştî gotinên herdu rojnaman hatin xwendin , û paşê jî , nirxandinên devkî û nivîsî yên beşdarên ji rewşa rojnemevaniya Kurd re li Sûriyê , û herweha pêşinyar û têbînên wan ji herdu rojnaman re, ew şev dewlemend kirin. Vaye emê li jêr gotina Newrozê pêşkêş bikin.

- Xwedî pênûsên hêja û xebatkarên rojnamegeriya KurdBeşdarên bi rûmetRêz , silav û pîrozî ji we...

*-Berî hertiştî em neçarin , ku we bi girîngî û pêwîstiya rojnemegeriyê di hemî aliyên jiyanê de hestiyar bikin. Ji berê û paşê ve , rojnemevanî di jiyana civakan de, bi roleke mezin rabûye . Hincaran bi roleke erênî lîstî û civak pêşde daye , û hin caran jî bervajî wê kiriye . yanê dema ku rojnemegeriya civakê li pêş , azad û serbest be xizmet pêşvebirina civaka xwe kiriye , û dema ku li şûn û ne azad be , wê civaka xwe bi şûn xistiye . Ji ber ku , ew hemî aliyên jiyan û civakê ronî dike , pesnê başiyar dike û şaşiyar rexne dike , wêlomê jî, bi destlata çarem bi nav bûye. Herweha di jiyana miletên bindest de , yên mîna gelê me yê Kurd , rola rojnamevaniyê hîn mezin û xurtir dibe. Ji ber ku , hebûna wan ji nifşên paşerojê diterxîne û bi cîhanê dide naskirin . Em dikarin bi kurtî rola rojnemevaniyê-bi taybetî di hevdema me de - bi van çend gotinan şirove bikin : Rojnemegerî û ragiyandin dikarin şoreşan hildin û gelan bi serbixînin û azad bikin , û bervajî wê jî dikarin civakan tar û mar jî bikin

*- çima rojnama newrozê?

Li gel rola dîrokî ya rojnemegeriyê ya ku , me li jor aniye zimên , pêşiyar gewrî li xwe ziwa kirine û gotine : Ziman kiltî , navnîşane û hebûn û nebûna miletin e Lewre jî zimanê me hatiye qedexekirin . da ku Kurd weke millet xwe ji bîr bikin , xwe nas nekin û hêdî-hêdî di hundir gelên di de bêne pişaftin. Rêberê kurdî û miletperweriyê seydayê mezin **Ehmedê Xanî** ji berî (315) salan , tiliya xwe danîbû ser birînê û bi dilşewatî gaziya xwe kiribû Kurdan ,da ku, ew pêşî guh bidin zimanê xwe yê şêrîn bi êş û xemgînî jî gote dora xwe û nivîsî lê, ez çî bikim sûk kesade , ma mirov "zaroyê xwe yê nexwaş bi zaroyê cîrana yê xweş digahêre "?!.

Mîrê gewre **Celadet Bedirxan** jî got : **yekîtiya kurdan bi yekîtiya zimanê kurdî ve girêdayî ye , û yekîtiya zimên jî bi yekîtiya tîpan pêketê.**

Dr. Nûredîn Zaza jî di dermafê zimên de weha digot:

Kurdo ger tu dixwazî xwe nas bikî , zimanê xwe nas bike , û eger tu dixwazî xwe bi xelkê bidî naskirin , dîsa zimanê xwe binase.

Jiber van gotinên jorîn ên pîroz ên gorbihuştên me , me xwast bi derçûna vê rojnamê , em bersivên bang û fîganên wan bidin û bibêjin : bila dilên we rûnin ,di gorinên xwe de şabibin. Vaye sûk pir nesekiniyeû bi sedan pênûs û pirtûk ,bi dehan rojname , kovar , pêlweş û qenalên wêneguhêzê yên kurdî , dihêlin ku dilê mirov geş bibe û rê li ber bikaranîna zimanê kurdî were qelaştin û dûz bibe.

Ji ber sedemên li jor me anîne zimên , em rojnama newrozê diweşînin û her û her jî emê berdewam bin . Li dawiyê em li hêviya berhemên pênûsên kurdî ne, taku, tevlihevûna van berhemên lehiyeke bi coş di hemî aliyên de , di paşerojê de çêbike.

Bîranînek Taybet

Enehîte Mored

Hersal di -13-ê Gulanê de, ew bîranîna bi êş û jan, têkoşer û nemira Kurd Leyle Hesên Qasim bi bîra me tîne ku , ew keça ciwan weke xwendekareke dilsoz di buhara temenê xwe de , zordariya li ser gelê xwe yê Kurd nepjirandî .Wisên jî bi bîrûbawerî li rex birayê xwe mêr di nêv refên partiya demoqrat a Kurdistan de ,bi serkêşiya lehengê nemir û rêzdar Mistefa Berzanî weke endameke rola xwe bi jîrekî lîstiyê , nemaze çalakî û livên wê di kastîna zanîngeha Bexîdadê de berçav û balkêş dibûn . Û roj bi roj wê cihekî bêlikirî di nêv refên ciwanên xwendekar de digirt .Tevî di wê demê de an di salên heftê de, rewşa jina kurd bêtir li şûn û di tariyê de li ber xwe dida . Ji ber ku Leyla nemir nedikarî lêdan û cudahiya li ser jina Kurd bipejranda . Lewre jî , wê pêwîst didît ku , ji erk û stubariyên her Krudekî bi rûmet çî jin an mêr be yên herî pêşî ku li pêş dijmin û neyaran hejar û destgirêdayî nemînin. Girînge Kurd li dîrok , zîman û civaka xwe xwedî dekevin ta ku tarûmar û wînda nebin . Vêca jî, wê bi serbilindî weke endameke dilêr û jîrek kar û xebata xwe li dijî zordariya rêjîma El-beis kiriye, lê mixabin Leyla hêja li encamê, di sala -1974-an de di gel hevalên xwe tîye girtin û wan davêjin binê hepis û zîndanên Ebo-xirêb û bi hemû reng û şêweyên nemirovane wan didine ber darên îşkençê. Lê, Leyla pêdar tu carî serî li pêş zor û setemkariya bêbextên rêjîma şoven neditewand . Wisên jî di -13-ê Gulana -1974-an de bi destên wan qirêj û gemaran, di gel hevriyên wê ve tîne bi darvekirin û weke pakrewaneke Kurd di nêv rêzên karwan û şehîdên kurd de cî digirt . Ji berî darvekirina wê bi şahnazî, ew cilên kurdî li xwede û sirûda Ey reqîb bi degekî bilind gotiye û piştî wê dibêje, bijî Kurd û Kurdistan . Bêguman Leyla hêja û

delal îro em tev deyndarê wê ne, vêca jî wê cihekî bêlikirî di hiş , raman û dilê her Kurdekî birûmet de girtî û ew îro bûye sembola pêdarî û dilêriya jina Kurd .Lewre jî pir zar û zîç bi navê wê lehengê hatiye binavkirin , û xwezî bi canê kesên ku , zaro û ciwanên xwe li ser riya Leyle Qasim perwerde û mezin dikin . Bêguman ew mal û kes pirin , ev yeka nîşna xêrê ye, vîn û şiyrbûna gelê me Kurd diyar dike ku rojên li pêş ji rastî û dadimendî re ne

Newroz Geşa Buharê ye ...

- Cotyarê Cûmê-

Li Buhara rengîn hemo daxwaz bi hêvî dibin û demsalên evîne berepêş dibin , dil û cîger bi tinazî berve Newrozê derin , kulîlka avdarê bi rengê xwe ,nîşana avdarê dide. Avdara buha, bi her tuştên ku di bîr û baweriya gelê Kurd de qet wenda nabe. Her avdarê bi êş , jan û şahiyên wê tîne berçav , wêne , bîranîn û çîrokên zivîstana sar li siruştê Kurdistanê şêrîn awazên xwe belav dikin . Newroz geşa Buharê ye , ew bi xwîna pakrewanên Kurd ên canê xwe kirine qurban hatî avdan. Ewên bûne fenera ronîkirina riyên dijwar ji gelê xwe û ala azadî û aştîyê re, ta ku, herdem li ba û bilind bimîne . Hîn ew rondikên dilsoz ji çavên delalokên şehîdan ziwa nebûne ,û xemgîn mane . Ew nemir bûne hetav û nîşana xebatkarên Kurd, ku bibe hêzeke mezin di çavên neyarên mafê gelê Kurd de .

Li roja 20 an ji Avdarê , agirê Newrozê , tê pêketin , û li 21 an jî , gelê me siruştê delal hembêz dike , hemo bi jîndarî û bi hêrs, stiran , sema û awaza sirûda kurdî ,deng û destan Newroza xwe li dar dixînin .Bila Newroz bibe roja xurtkirina xebatê li dijî zagonên nijadperest û danesîna mafên gelê Kurd .

Newroz cejna netewî ya gelê Kurd e .

Dumahîk : 17 ê...

û bi çekên giran ji serê gir berxwedaneke bê hêvî dikirin, ta ku, hûravêja Liyandirî ji germa çiriya.

Dema şev kete erdê, di navbera serşîv û yasîna de, leşkerê Haco êrîşek mezin bir ser Beyandûrê û bê rawestan, ta ku ketin serayê û agir berdanê. Ji qesrê êrîşek birin serê gir, biryargeha leşkerî û ew jî ket bin destên wan û çend zabit û nefer li wir jî hatin kuştin. Di vî şerî de, zirara frensiyan 9kuştî, 14 birîndar û yek winda bû. û leşkerên mayî bi serokatiya Yonan Morêl di bin agirbaranê de ,reviyan û xwe gihandin mala Ehmedê Ûsiv li gundê Sîha, û bi alîkariya wan ghiştin Hisiça.

Di wê şevê de em li ser serê girê Girêsiwêr bûn me temaşeyî agirê seraya Beyandûrê kir, û bi rojhilata roja dî re, ez digel çend feqehên hevalên xwe çûn Beyandûrê, da wê şewatê bi çavên xwe bibînin. Dema ghiştinê, hîn dûmana agir ber bi azmana ve hildikşiya jor û dormedorî qesrê û biryargeha serê gir, bi laşên kuştî yê leşkerên ifrensî dorpêçayî bû.

Ev bûyera giring û şer û kuştinê çêdibûn, lê Yotman Robêto "Rogan" dûtî vê eniya şer bû. Ew bi sed leşkerê xwe yî siwar ve çûbû Eyndîwerê ,û li gor lihevhatina 1916 ya Sykes-picot sînor di navbera xwe û Tirkan de rast dikir. Gumanên wî ji van tiştan tune bû.

Di vegera xwe ya ber bi Beyandûrê ve, dema ghiştê wî diyarê rojhilatî Tirbespiyê -ku aniha jê re Diyarê Topê tê gotin- bi durbînoka xwe li Beynadûrê nêrî, lê çi bibîne?! Qesreke şewitî ku hîn dûman jê bilind dibe, ji nû ve bawer kir ku şuxul xirab e.

Ji nişka ve Rogan dît ku ew û leşkerê xwe bi çekdarên eşîran hatine dorpêçandin .(Ev eşîrên Kurd bûn û yek jê eşîreke erebên Cewala bû-Gotina nivîskar). Şer careke din di navbera wan de û bi rengekî dijiwartir

dest pê kir. Lê, çekdarên wan eşîran berê xwe ji gule û berikên hûravêjên leşkeran neguhertin, ta ku ketin nav hevûdu û di yek se'etê de leşkerê Rogan ji hev belav kirin. Rogan digel çend zabitên hevalê xwe û hejmarek ji leşkeran hat kuştin û çend leşker dîl ketin. Dîsa her kes vegeriya mala xwe, lê vê carê kar û barê bazdanê kirin. Ewan baş dizanî ku hikûmeta firensayê bi kîn û kerb e, heyfa leşkerên xwe li erdê nahêle.

Roja din xelkê welêt dest bi barkirinê kirin, berê koç û terş û talanan dan serxetê, riyên gundan wek rêçika mêrûwan ji ademîzadan û heywanan hatin dagirtin, hin ber bi jor ve diçûn û hin ber bi jêr ve dihatin. Ta bû çaxê danepêza, me dît ji nişka ve, gurên û nalîn bi azmên ket, ew jî dengê 34 balefirên cengî yê firensî bû, wek gêşê teyra di ser herêma Sinceqê Aşîta re çûn û hatin û welat bi çol, gund, ademîzad û heywanên wî ve bombebaran kirin..."

Li dawiyê, gurzek gul diyarî rewanê hemî pakrewanên welatê me Sûriyê dikim ,û her û her welat û welatîyên me azad û serfiraz bimînin.

Dumahîk : Hersal roja...

xwendin û nivîsandina bi zimanê dê , da ku em xwe nas bikin û xwe bi xelkê bidine nasîn .

Kêm zêde bi vî awî emê karibin li bîranîna salvegera roja rojnamevaniya Kurd û xwediyê wê Miqdad Midhet Bedirxan bibine xwedî û jê re dilsoz bin , weke çawa ji berî dora 70 ê salî li şamê , Mîr Celadet bi cerg û hinavan , bi ronîya çavan dibû berpirsiyar û xwediyê herdu kovarên hêja Hawar û Ronahî û birayê wî Mîr Kamîran li Beyrûtê dibû berpirsiyar û xwediyê herdu kovarên Stêr û Roja Nû . Em jî li Sûriyê , di vê dema me ya nû de , di vê serdema 21 an de - ku her diçe bandor û kartêkirinên rolên rastiyên globalîzmê di hemî warên jiyana kes û civakan de xurtir û berfirehtir dibin - dîsa jî emê karibin li ber xwe bidin , bixwînin û li zimanê xwe yê dê xwedî derkevin , da em nehêlin bête pişaftin , ji bîr bibe û bête wendakirin . Emê her û her camêrên zana weke Miqdad Midhet Bedirxan bi bîra xwe bînin û ev weşana Newrozê ya ku serûberê wê bi zimanê dê bidomînin û geş bikin .

17ê Nîsanê, Cejna Niştimanî ya welatê me Sûriyê

Rêberê Silîvî

Sala 1920an, piştî lihevhatina Sykes-picot, welatê me Sûriya îro kete bin mandatkirina Firensayê û sala 1923an, leşkerê dagîrker bi serokatiya fermanî frensî yê navdar Rogan gihîşte devera Cizîrê.

Gelê me yê Kurd jî li hemî deverên xwe yên dîrokî, mîna birayên xwe yên Sûrî ji ol û nijadên dîtir, tîrş û taliya zordestiya dagîrkeran tam kiriye, ji bo berdan û derkirina wan ji xaka welêt xebat kiriye û qurbanîyên giran û buha daye.

Gelê me çi li Cizîrê, Kobanê yan Çiyayê Kurmênc, li dij Firensa serî hildaye. Dema ku, cara pêşîn ew derbasî Şamê bûye, Yûsif Al-Ezme yê Kurd digel têkoşerên Ereban, di şerekî ne humkuf de, ji bo parastina xaka welêt, xwîna xwe ya buha rijandiye û bi mîrxasî yekîtiya netewî li ser xaka welêt nîgar kiriye. Di şoreş û serhildanên rizgariyê de, gelê me berevanî di ber welatê xwe de li deverên Kurdî û li Şamê jî kiriye. Lê mixabin, îro karbidestên dewletê bi çavên gumanê li welatparêziya gelê me temaşe dikin, siyasetên nijadperest derheqa hebûna wî, ziman, çand û folklorê wî bikartînin, pîlanên birçîkirin û lawazkirina wî bi rêve dibin û li hember pêşketina wî ya xwezayî keleman diçînin. Wan, hemî cangorî, xebat û kêferata gelê me yê Kurd a ji bo avakirina welatekî xweser û bi rûmet, ku hemû

pêkhateyên wî azad, serbest, û bi rûmet bijîn, ji bîr kirine û ew dane ber şek û pekan!! Ev gunehkariya mezin a îro li gelê me dibe, yekîtiya niştimanî dipelêxe, dihêle ku kesê Kurd nema bi girêdana xwe bi welatê xwe ve hestewer û serbilind be. Ev yeka ha bûye birîneke kûr û di laşê welêt de cî girtiye. Bêgumane rojekê ewê ji ber ve bêne darizandin.

Di vê bîranîna pîroz de û mîna nimûneyeke balkêş ji beşdariya gelê me di berxwedan û serhildanên dij dagîrkrên firensî de, ez vê parçeya bijarte ji pirtûka mamosta **Samî yê Mele Ehmedê Namî** pêşkêşî xwendevanên NEWROZê dikim.

Di pirtûka xwe ya bi navnîşana "**Dîmenin ji dîroka wînda**" de, Mamoste Samiyê Mele Ehmedê Namî, destnivîseke bavê xwe, nivîskar û helbestvanê bi nav û deng ê gorbuhuşt Mele Ehmedê Namî parastiyê, Seydayê M.E.Namî, wiha gotiye:

" Di roja 28.06.1925an de, çekdarên Haco- ku nêzikî hezar çekdarî bûn- kozik û çeperên xwe li dormedorê Beyandûrê danîn, nemaze li bakurê gund, li pişt axa xeta hesinî a tirênê. Bi berbanga sibehê re, agirê şerekî dijwar pêket û wê rojê ta êvarî ji her çar aliyan ve, agir li qerargeha serê gir hat barandin.

Sercanê firensî Liyandirî bi hûravêja xwe digel 80 leşkerên firensî ve **D.R (11)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de